**Têbîniyên herî girîng bi awayê kurt tên gotin:**

Li Pirtûkxaneya bajarê Kolnê tê yê komeleke berfireh a pirtûkm kovar, DVD, pirtûkên bideng, lîstikên komputerî û gelek tiştên din bibînî. Bi giştî 800.000 medya hene.

**Karta Pirtûkxaneyê**

Ji bo serdana pirtûkxaneyê û werghirtina bi deynê, hewcetiya te bi Karteke Pirtûkxaneyê heye. Tu bi hêsanî dikarî ji bo vê yekê navê xwe tomar bikî. Tomarkirin li her yek jin navendên me pêkan e, tenê pêwîst e ku serdana wir bikî. Ji bo tomarkirinê hewcetiya me bi çend belgeyan heye. Her yek ji wan di dewamê da hatiye.

Tu bi rêya pêkanîna tomarkirinê qanûn û lêçûnên me qebûl dikî.

**Endamtî û lêçûn**

- **Salek ji bo kesên temendar** — **30 Euro ji bo 12 mehan**
-
- **Endamtiya demdirêj ji bo yên temendar** — **30 Euro ji bo her 13 mehan**
-
- **Endamtiya demkurt** — **17 Euro ji bo 6 mehan an jî 9 Euro ji bo 3 mehan**

Belgeyên tomarkirinê.

- ❖ Karta Naskirinê
  An jî
- ❖ Pasport û Gewahiya Tomarkirinê

Endamtî bi daşikandin:

- **Endamtiya bin 21 salî:** — **Belaş**

Belgeyên tomarkirinê:

- ❖ Nasnameya Dêûbavan an jîPasport û Gewahiya Tomarkirina Dêûbavan
- ❖ Wajoya kesekî mezin (Dayîk/bav, qeyîm an jî garantor)

Zarok di dema tomarkirinê da heye an jîKarteke Naskirinê ya zarok (Nasnameya zarok, Karta Naskirinê ya Dibistanê an Gewahiya Jidayîkbûnê)

- **Endamtiya kesên mezintir ji 21 salî**
  **Ji bo xwendevan, xwendekar, fêrxwazên Kar, kesên ku Xizmeta Leşkeriyê an jî Xizmeta Xwebexş derbas dikin:**
  **15 Euro ji bo 12 mehan**
  **An jî 8 Euro ji bo 6 mehan**

Belgeyên tomarkirinê:

- ❖ Karta Naskirinê
  An jî
  Pasport û Gewahiya Tomarkirinê
- ❖ Karta Naskirinê ya Dibistanê, Karta Naskirinê ya Fêrbûna Kar, Karta Naskirinê ya Xizmeta Leşkeriyê û hwd.

- **Kesên bi astengdariya giran:** **15 Euro ji bo 12 mehan**
  **8 Euro ji bo 6 mehan**

Belgeyên tomarkirinê:

- ❖ Karta Naskirinê
- ❖ An jî
- ❖ Pasport û Gewahiya Tomarkirinê
- ❖ Karta Naskirinê ya Astengdariya Giran

- **Karbesbûyî û Meaşgir:** **15 Euro ji bo 12 mehan**
  **8 Euro ji bo 6 mehan**

Belgeyên tomarkirinê:

- ❖ Karta Naskirinê
- ❖ An jî
- ❖ Pasport û Gewahiya Tomarkirinê
- ❖ Karta Naskirinê ya Karbesiyê

- **Xwediyên Köln-Pass'ê:** **10 Euro ji bo 12 mehan**
  **5 Euro ji bo 6 mehan**

Belgeyên tomarkirinê:

- ❖ Karta Naskirinê
  An jî
  Pasport û Gewahiya Tomarkirinê
- ❖ Köln-Pass

- **Endamtî ji bo Kompaniyan** **182 Euro ji bo 12 mehan**

Zanyariyên têkildarî endamtiya Kompaniyan: 0221 221 23939

**<u>Bo çi heyamekê dikarî medyayên me li cem xwe hilgirî:</u>**

Du moletên bideyn-wergirtinê hene:

- **Çar hefte:** Pirtûk, pakêtên medyayî, CD-ROM û alavên destek-fêrkarî, not û nexşe.
- **Du hefte:** DVD, CD, pirtûkên bideng, lîstik û kovar.

**Lîsteya Biha:**

- Veqetandina reservkirin medyayekê ji bo te: 1 Euro
- Deynwergirtina navbera pirtûkxaneyan di berdêla her siparişekê da: 2.50 Euro
- Bideynwergirtin di rewşa jibîrkirina Karta Piertûkxaneyê ji aliyê te va: 1 Euro
- Karta Pirtûkxaneyê ya nû di rewşekê da ku te karta xwe ya pirtûkxaneyê winda kiribe: 3.50 Euro

**Derengkirin:**

Di rewşa vegerandina medyayê bi derengî da:

- Ji bo her medyayekê, 1 Euro ji bo hefteyên destpêkê yên derengkirinê.
- Zêdeyî 25 Euro ji bo her medyayekê ji hefteya 11an û pê va.

**Bibîrxistin:**

- Ji bo bibîrxistina yekem bi rêya Postê 1 Euro
- Ji bo bibîrxistina duyem bi rêya postê 1.20 Euro
- Bi rêya **bibîrxistina bi rêya Emailê** lêçûnên bibîrxistinê **nayên**sepandin.

**Tambûn, zirar û vegerandin**

Gişt medyayên ku bi deyn werdigirî, vekolîne. Eger tiştek winda bûbe an zirar dîtibe, me haydar bike.

Em nikarin kualîteya medyayan misoger bikin. Ev her wiha tê vê wateyê ku di rewşa nerzîbûna te ji medyayekê, em ê ti lêçûnekê li te venegerînin.

Ji bo her medyayeke vegerandî, tu yê meqbûzeke vegerandinê wergirî. Ji kerema xwe hemî meqbûzên me bi qasî 4 mehan li cem xwe hilgire.

**Dirêjkirina heyama deynwergirtina medyayê**

Tu dikarî heyama bideynwergirtinê ji bo pirraniya medyayan dirêj bikî. Tu dikarî hesaba xwe ya mişterî li Înternetê an jî komputerên heyî li pirtûkxaneyan bibînî. Deynwergirtina Medyayan herî pirr du caran û tenê di rewşekê da ku reservkirî nebin, dikare were dirêjkirin.

**Dewsgirkirin, windakirin û Cihguhestina Karta Naskirinê ya Pirtûkxaneyê**

Eger cihê te hat guhestin, ji kerema xwe guherîna navnîşana xwe ragihîne. Eger te Karta xwe ya Pirtûkxaneyê winda kir, bilez wê asteng bike. Lêçûna Karta dewsgir 3,50 Euro ye. Karta Naskirinê ya Pirtûkxaneyê **nikare** bo kesên din were guhestin.

Zanyariyên pirtir li ser adresa: www.stbib-koeln.de